**Kongra Netewiya Kurdistan**
*Kurdistan National Congress*
**Congrès National du Kurdistan**
KNK

Rue Jean Stas 41 1060 Bruxelles tel: 00 32 2 647 30 84 fax: 00 32 2 647 68 49
Homepage: www.kongrakurdistan.com e-mail: knk@kongrakurdistan.com

# JI BO RAYA GIŞTÎ

17.06.2003

Ev demek e rejîma Sûriyayê helwesta xwe ya dijminane li hember Gelê Kurd her ku diçe hişktir dike. Zor û pestan di vê dema paşî de roj bi roj zêdetir dibe û êdî gihiştiye asteke bilind. Di vê dema ku guhertinên mezin di rojhilata navîn de çêdibin, ji Sûriyayê ji berê pirtir tê xwestin ku gavên demokratî bavêje, nasnama Kurd bipejirîne û rêz ji mafên Gelê Kurd re bigire. Lê belê bi van gavên berûvajiyê şopeke wisa nayê xuyakirin.

Di van çend mehên dawî de, ji serê salê heta niha hêzên asayişa sûrî 25 (bîstûpênc) welatparêz û soreşgerên Kurd girtine û teslîmê Dewleta Tirk kirine. Bi vê siyasetê Sûriye dixwaze xwe nêzingê Dewleta Tirk bike û rejîma xwe bi arîkarîya wan biparêze. Ev siyasteke ji binî de çewt û şaş e. Ji xwe rejîma Tirkiyê di tehlîkê de ye û ew bi xwe muhtacê parastinê ye, ewê çawa ji rêjîma Sûrî re bibe arîkar?

Li aliyê din, Kurdên ku bi awakî demokratîk li naskirina nasnama xwe xwedî derdikevin an dixwazin mafên xwe yên demokratîk bi kar bînin, bi hişkî û şidetê diçe ser wan, wan digire, di bin îşkencan re derbas dike û bi tewanbariya cihêxwaziyê wan dide ber mehkemeyan û cezayên giran li wan dibire.

Sûriya bi van kiryarên xwe her di siyaseta xwe ya kevnar de berdewam dike; siyaseta dijminhiya gelê Kurd û hevkariya li gel rêjîmên Tirkiya, Îran û berê jî ya Îraqê. Lê belê rewşa cîhanê ji zû ve hatiye guhertin û ya herêmê jî êdî tê guhertin. Dema perçiqandina gelan bi darê zorê êdî bihuriye. Rêya here rast û durist naskirina mafê gelan û hevdu pejirandin e. Tenê bi vîn û îradeya azad gel dikarin bi aştî û aramî li gel hev bijîn. Kî di siyaseta kevnare - siyaseta perçiqandinê de berdewam bike, ewê di pileya pêşîn de bi tenê bimîne û di pileya duyem de ji bin de têkbiçe

Em weke Bûroya Başûrê Rojavayê Kurdistanê ya KNK ê, vê helwesta Dewleta Sûrî şermezar û mehkum dikin; bang li hukumeta Sûrî dikin, ku dev ji vê helwesta xwe ya çewt û dijminane berde û bi nûnerên Gelê Kurd re bikeve nava diyalogê.

Herweha em bang li Gelê Kurd dikin, ku li hember van kiryar û zordariyan raweste û çalakiyên xwe yên demokratîk berdewam bike.

**Bûroya Başûrê Rojavayê Kurdistan ya KNK ê**